

•• SAL PÊŞANDAN Û ŞANO LI
BOKANÊ



Birayim Ferşî

Werger: Muhsîn Ozdemîr

◦• SAL PÊŞANDAN Û ŞANO LI BOKANÊ

Destpêka Pêşandan Li Bokanê

Sedemê serekî ji bo destpêkirina karê şanoyê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê, hebûna rêveberiyên fêrkirin, çand û huner, rodyo, televîzyon, parêzgarî, fermandarî û şaredariyê bûye! Di wan bajarên ku tenê rêveberiyên fêrkirin û perwerdehiyê hebûne de, cureyek pêşandanê pêkhatiyê bi navê pêşandanên netewî û welatî. Ku ev jî di rojên wan ên netewî yên wek rojên; *4ê Abanê(Mijdarê)*, *7ê Behmenê(Sibat)*, *21ê Esfendê(Adar)*, *21ê Azerê(Berfanbar)* de pêk dihatin. Bokan jî di nav wan bajaran de bû! Her çiqas, li Bokanê dibistan bi awayeke nû di demê Riza Şah de hatibe avakirin jî, dibe ku pêşandanên bi vî rengî ji salên 1901an û virve dest pê bibin. Kê di van pêşandan de cih girtiye bi temamî ne zelal e. Ew ên ku heta sala 1972an navê wan dixwiyê ev in:

Xefur Hacî Xefurî, Husên Miradbegî, Mhemed Azerî, Ebubekr Xefurî, Husên Se'îdî, 'Elî Celalî, Husên Dihbendî, 'Usman Fethî, Cewadî Cewahîrî (Xelkê Mehabadê ye), Macid Hemze (Xelkê Seqizê ye), Xalîd Rezayî, Mhemed Emîn Şêrxanî, Reşîd Azadîxwah, Husîn Melek Pûr, Mehmud Weysî, Mihemed Kerîmî, Nadir Qadrî, Ce'fer Merdanbegî, Mensur Feruxî, 'Ezîz Merdanbegî, Cucî Îranî, Dulber Fethî, 'Ebdula Emînî, Fetah Îsma'îl Pûr, Fetah Sûrxî, Husên Serkar, 'Usman Îsma'îlî, Mensur Helebî,

Ehmed Sambegî, Husên Mihemedyan, Yûsif Weten
Perest, Ce'fer Şekeranî, Fayîq Ademî(Xelkê Seqizê ye),
Mihêdîn Kerîmî û hin kesên din!

Bernameyên van cejnan ji strangotin, helbestxwendin,
pêşandanê komedî û “ netewî û welat(welatparêzî)!
Maqûlên bajêr û desthilatdariyê bi kartên vexwendinê û
kartên himetî ‘alî(bi peredan,) bangewazî dikirin û di rêza
pêşî de jî rûdiniştin. Yên din ên wek kesên ji rêzê û
xwendevanan diviyabû bi tomenan biletê bikin!
Rêveberên van bernamayan, ew kesên paye bilind- mîna
mamosteyê dibistanên Amadehiyê Mehmûd Hîşamî(wek
Mehmûd Qîşqere, mamosteyê dibistana Amadehiyê ya
bajarê Mehabad), Sîrûs Tewfîq(mamosteyê Kîmyayê û
reîsê dibistana amadehî,(xelkê Meraxeyê ye) û Reşîd
Azadîxwah(mamosteyê wêje û cêgirê reîsê dibistana
Amadehiyê, berpirsyarek ji hizba Panîranîst û hizba
Rastexîz (Qiyamet) ku ev nivîskarê piraniya pêşandanan
bû. Pêşandanê wek “xwîn û ax(ev di erşîva min de heye)!
Li Bokanê koma şanoyê li holê nebûye. Her salê hin kes ji
aliyê berpirsiyaran ve yan ji aliyê Hizba Panîranîst û Hizba
Rastexîz ve dihatin hîlbijartin yan jî ew bi xwe diçûn
alîkarî dixwestin. Ev kes êvaran piştî dersên rojane diçûn
û di odeya dibistanekê de prova dikirin. Naveroka van
pêşandanan pêdagotina çand û dîroka desthilatdariya
Şahenşahî bû. Kur di van pêşandanan de bi cil û bergên
kurdî, xencer li ber piştika wan re bi navê “Xeyur” û
merzdarî” bi rêgeza Îranî dihatin nîşandan ku bi zimanê
farsî û hestên Îranîbûn û şahperestîya xwe derbibrin, ji
aliyê temaşevanan ve bi çepikan dihatin pêşwazîkirin!’??
Gelek caran termê vî Merzdarê Xeyûr¹ li hember êrîşê
dijmin de -ku her car ev kurd bûn-diket ser dika şanoyê.

Di vir de yê maqûl dest bi çepikan dikirin!! Hin caran karê henekan dikirin. Ji aliyê hin kesên wek Xalîd Rezayî, Mihemed Emîn Şêrxanî, Xefur Hacî Xefurî, Husên Miradbegî û kesên din ve pêşandanin dihatin kirin lê ji naveroka pêşandanên netewî û welatî dûr bûn; ev jî; ya Maşîn Miştî Mem Delî, jiyana Fîrdewsiyê Tusî, û xwendina helbestên Areş Kemangîr,, Siyaweş Kesrayî bûn.

Rolgirên pêşandanên komediyê jî ev kes bûn: Husên Melek Pûr, 'Usman Fethî, Macid Hemze, Cewad Cewahirî, Mîhemed Kerîmî û kesên din! Mijara wan jî jiyana rojane ya gel bû, henekên xwe li gel dikirin ku nîşek-cûrek henekeriyê bû, carna jî li ser belavkirinên nûçeyên televizyonan bû, stranê kurdî, farsî dihatin pêşkêşkirin û mezinahiya binemala Pehlewî dihat xwendin.

Koma Şanoya Lawan A Boka

Di destpêka meha Pûşper ١٩٧٣an de, di “dibistana amadehî ya Kuroşê Kebîr de koma Şano ya Lawan bi beşdarbûna van kesan hat damezrandin: Sara Rostemzade, Şehîn Mîrî, Cexfer Merdanbegî, 'Ewlla Emînî, Nadir Qadrî, Birayim Ferşî! Mihemed Reza Efzel, mamosteyê karmend bû, ji Tehranê bû, berî jî ev kar kiribû. Wek derhêner û rêveber bi komê re dixebitî. Provakirin jî li odeyek a dibistana amadehî ya Kuroşê Kebîr bû. Bi vî awayî koma Şano ya Lawan pêkhat û şanoya yekemîn bi navê **Hifre, Kûne Eşkewt** di meha sermaweza ١٩٧٤an de ji pêşkêşkirinê re hat amadekirin

Dekor şkekft bû, ji kaxezên kevin yê çîmentoyê(Bi rengê reş û qehweyî hat rengrêjkirin) û texte û dar hatin amadekirin Ev jî bi pêşnûma û zehmetiya kek Efzel pêk

hat. Plaket hat nivîsandin û bi camên dikanan ve hatin daleqandin, her weha dibistan jî bi van plaketan dixemilandin.

- Koma Şano ya Lawan pêşkêş dike, Şanoya Kûne Eşkewt, nivîskar Nasir Îranî, derhêner Mihemed Rza Efzel, rolgir(lîstikvan): ‘Ebdula Emînî(pîremêr), Ce’fer Merdanbegî (Murteza), Nadir Qadirî (Hesen), Birayim Ferşî(Kazim)

Girîm û dekor(Efzel), cihê pêşkêşkirinê(Pirtûkxaneya Bajêr/Parka Zarokan, pêşberî dibistana Şapûr), rja pêşkêşkirine: (٢٠ û ٢٦/٠٩/١٣٥٣) demjimêr ٧ê piştî nîvro, têketin belaş e!

Şeva destpêkê tenê sî temaşevanên şanoya yekemîn li Bokanê bûn. Şeva duyemîn ٧٠٠ kesan xwe berdan nav holê(talarê)! Pîr û law û keç û mamoste û xwendevan li tenîştê hev rûnişibûn yan jî şîpiya sekinî bûn. Cara yekemîn bû k udi vî bajarî de du keç rêveberê bernamêyê bûn. Sara Rostemzade xêrhatinê li temaşevanan dike û Şêhîn Mîrî helbestan dixwîne!(destpêkirina vê şanoyê hevdem bû bi pêşketina keftûleftên Başûr ku **binkeyên** wan li Îranê jî hebû). Murteza û Kazim û Hesen sê serbaz(leşker) bûn û ji eniya şerî reviyabûn. Li cihekê digerin ku xwe lê veşêrin. Ev cihê ku hatinê cihê pîrêmekî ye! Çîroka jiyana vî pîrî perçeyek a hêmana şanoyê ye. Bi vê riyê şer û niştimana xoşewîst tê vegotin û vekolîn! Şanoyê li Bokanê û herêmê deng vedaye, radyo û televîzyona Mehabad bi lez û bez xwe gihandin Bokanê. Bi komê re rûniştin û gotûbêj kirin, ev gotûbêj bi zimanê farsî û kurdî di radyoyê de hatiye belavkirin! Di vir de ya ku cihê derbirîna mijarê bû, bîr û bûçûnên wan herdu keçên xwendevan bû. Ku di vê derbirînê de dijî

nêzîkbûnên dayîk û bavên xwe yên li ser hunerê axivîn.
Piştî rojnameya “Îtla’at” bi komê re gotûbêjek çêkir.
Piştî vê Şanoyê ji komê tenê ‘Ewla Emînî û Birayim Ferşî
man. Keç piştî şano û gotûbêja li radyo û rojnameyan
ewqasî deng jî veda bû, izna karê şanoyê ji wan re nebû,
ji wan hat sitendin’

Şanoya Azad

Ce'fer Merdanbegî û Nadir Qadrî, Mihemed Kerîmî û
Mehmûd Weysî koma Şanoya Azad damezrandine, hem
karê xwe î welatî dikirin hem şano: wek mînak:
“Dîkte û Zawîye” nivîsa Nadir Xulam Husên Se’dî ye, di
festîvala Mehebadê de hat pêşkêşkirin.
Dîsa Koma Şano ya Lawan
Koma Şano ya Lawan bi kesine din re kolan bi kolan û di
pêşbirka parêzgarî ya Urmîyê de baştirîn derece girtiye û
çend ji endamê wê ji bo heftiyekê seyrane bikin şandin
perava Deryaya Xezer!

Kilasa(Pol) Şanoyê

Sala piştî wê ji aliyê rêveberiya fêrkirin û perwerdehiyê ve
di dibistana Şapûr de odeyek dane vê şanoyê. Di
destpêka pûşpera ٥٤٧٥(١٩٧٥) de, Kelasê bi beşdariya ٢٠
kesan karê xwe domand. ‘Umer Hemîdî rêveberiya
Kelasê dikir! ‘Umer Hemîdî mamostayê “Xwîdge”yan bû
hay ji wêje û helbestê hebû. Ev ٢٠ kesina ji bo şanoyê
nehatibûn. Çend xanimên nû bûyîn mamoste di vê polê
de bûn qet têkiliyan bi şanoyê re tunebû. Çend kesên

Seqizî jî xeta wan a siyasî bi 'Umer Hemîdî re hebû ku ew vekişandibûn nav vê polê!

Şanonameya Balte:

Şanonameya Balteyê Gogol prova li ser hat kirin û di meha Xermanan de ji b odu şevan di hola(talar) pirtûkxaneya bajêr de hast lîstin û ji aliyê gel ve pêşwaziyek baş lê hat kirin. Derhêner: 'Umer Hemîdî, şanoger jî ji: 'Ewla Emînî (Eleksî Petrowîç), Birayim Ferşî(Akakî Akakîwîç), Salah Rostemî(xizmetkar) Birayim 'Ebdulayî(Kurê terzî).

Neveroka şanoyê li ser jiyana miaşxwerekî û terzî bû, vê şanoyê bala gelek kesan kişandiye ser xwe, regekî ramyarî(fikrî) daye komê. Piraniya temaşevanên vê şanoyê ne tenê xwendevan, terzî û miaşxurên dewletê jî bûn. Piraniya terziyan du rêborkên Bokanê girtibûn û daxwaza damezrandina koma şano ya terziyan dikirin!(wê demê tîma lîstika topanê ya terziyan hebû).

Li pey hev bi pêşkêşkirina vê şanoyê re navûdengê vê komê ghişt zanîngehên Tewrêz, Êrmiye û bajarên din ên Kurdistanê. Wek mînak; hunermendekî Mehabadî bêyî jê were daxwazkirin ew bi xwe tê berpisyariya grîm(makyaj-pêşnuma) a Şanoya Balte digre ser xwe!

Kurî Xak(Kurê Axê)

Piştî şanonameya Balte, şanonameya Kurê Axê hat nivîsandin û provayên wê dest pê bûn! Çîroka vê şanonameyê qewmînek a li ser gundekî Loristan heyî ye ku mebest kurdistan bi xwe ye. Gund ji ber hişkesaliyê

(bêbaraniyê) dişewite. Melayê gund jî saya rejîma şah mala wî li bajêr bû û zaroyên wî li wir diçûn dibistanê. Gel hewl û handan dida ku ber bi bajêr ve biçin û terka gund bikin. Hin ji wan ên wek alîgirên Melê û ji bo sûdê ji derfetên bajêr ên wek birq(elektirîk) û av û dibistan û nexweşxane û derfetên karkirinê bigrin, dixwestin gundê xwe vala bihêlin û herin bajêr. Kesên din serê wan gêj dibe-dîn dibe, di wê heynê de mala Ehmedî bi çend zaroyan ve biryara li gund mayînê didin! Şano bi bûka baranê ya zarokan dest pê dike!

Ev şano di sînemayê de te pêşkêşkirin, her car ١٥٠٠ kes temaşevanên wê hebûn. Vê carê ne tenê karker, mamoste, xwendevan, gundî, bajarî û maqûl jî hatibûn. Şano bi zimanê farsî bû, lê ruh û rewîşt û behs û qewmîn, cil û berg û cihê qewmînê hemû peywndî bi kurd û kurdistanê re bû. Cihê provayê di fêrgeha Nûbinyadê ya li taxa Bazara Heywanan bû!

Kurê Axê di meha Xezelwera ١٣٥٤(١٩٧٥)an de hat pêşkêşkirin. Nivîskar û Derhêner ‘Umer Hemîdî bû. Ev şano li bajarên wek Bokan û Mehabadê hat pêşkêşkirin û pêşwaziyek baş jî lê hat kirin. Li Bokanê di talara sînemaya Se’dî de ٣٠٠٠ kesian lê temaşe kiriye, Li Mehabadê di Mala Lawan de(Xeneyê Cevanan) di şevê de ٣٠٠ kesian lê nihêrî!

Karê dekor û makyaj û cilûbergê bi giştî ji aliyê komê ve çêbûye. Dekor gundekî nîşan dide, cil û berg bi kurdî bû!

Kes:

Desteya yekemîn a zarokan: Reza Şemamî, Reza Îsafî, ‘Elî Azerguşesp.

Desteya duyemîn a zarokan: 'Elî û Rehman Azerguşesp.
Şêt(dîn): Fetah îsmâîl Pûr, ('Elî) 'Umer Hemîdî, (Ehmed)
Birayim Ferşî, (Ezîz) Kemal 'Ebbasî, (Axund) Ce'fer
Rostemî, (Rehîm) Kemal Behram Wend.

Kes: Desteya yekemîn a zarokan Reza Şemamî, Reza Îsafî,
'Elî Azerguşesp, desteya dûyemîn: 'Elî û Rehman
Azerguşesp.

Kurê Axê di festîvala şano ya Mehabadê de di nav
komên wek Koma Şanoya Çand û Huner A Mehabadê,
Koma Radyo û Televizyon A Mehabadê, Koma Şanoya
Azad A Bokanê, Koma Reqsê Ya Bajarê Merîwanê de
dereceya herî bilind wergirt.

Di demekî kurt de piştî pêşkêşkirina vê şanonyme yê gelek
kes li navçeya Bokanê hatin binçavkirin. Ji wan yek jê
'Umer Hemîdî ye. Tirs dikeve dilê gelek kesan û herweha
nav komê jî. Hin ji wan ji Kurdistanê jî derketin. Êdî kes
xwe nedikir xwediyê komê!

Şanoya Lawan û Şanoya Mêrmindal

Piştî çend mehan bi ser têkçûna pola şanoyê, werçerxiye
û vê carê jî yên ku daxwaz dikin zêde bibûn. Ji neçarî du
pol hatine vekirin. Yek jê serpereştiya 'Ewla Emînî, ya din
jî bi serpereştiya Birayim Ferşî. Her weha koma şano ya
nûciwanan ku ji zarokên bin 10 salî pêk dihat, hat
damezrandin. Di vê salê de piranî di nav komên Bokan û
Kirmaşan û Mehabadê de pêwendî hatin xurtkirin. Bi
taybet peywendiya şanoya Law bi Nusret Seyafî û Ataş
Teqî Pûr bi hêz bû. Ji ber vê, şanoya "durî Xerîp" (*dûriya
Biyani*) ya ku Nusret Seyafî nivîsibû ji bo pêşkêşkirinê hat
hilbijartin. Piştî amadebûna Resûl Penahî (berpîrsê

rêveberiya fêrkin û perwerdehiyê ye) ji bo izin girtinê serî li rêveberiya çand û huner a Mehabadê dide. Ev rêveberî jî neyekserî izin dide.

Zarok û Seggel

Izna Dûrî Xerîp hat dayîn lê izna se(kûçik) û zarokan nehat dayîn ku bileyîzin û dest danîn ser. Bi mihaneya ku dibên; zarok di kavilekî de piştî xwe dabû “avahiya mala dewlemendekî û mijûl dibin! Ev kavi cihê kûçikê beredayî bû! Zarok li vê derê paşa û wêzîriyê dikin seggel jî taca şahî û wezîrên wî dixin serê zarok. Di daîra çand û huner a Mehabadê de ev tişt bêrêzî bû ji binemala Pehlewî re. Yek ji endamê Şanoya Nûciwanan di nameyeke xwe de weha dinivîse:

Koma Şano ya Nûciwanan piştî ٩ meh provayê, agahdariya qedexebûna şanonymeyê hat kirin, ev jî dihat pêşbînîkirin. Ji ber vê di dema provayê de gazî temaşevanan dihat kirin ku lê binêrin. Bi vî awayî ٣٠٠ kesan li şanoyê temaşe kir. Ev şano ji ber dariştin û şêwaza gotinê bandorekî xurt kir. Şano gelekî bê perde(aşkere) behsa civaka jêr desthilatiya Pehlewî dikir. Her tişt di çarçoveyek biçûktir de xweşiktir dixemiland-dirêsand, ev şano maketeke biçûk a civakê bû û nêzîkî jiyana me ya rojane bû. Hezkerên me-hevalên me- bi vê şanoyê bi cureyek bû ku piştî qedexekirina şanoyê ji aliyê desthilatiyê ve rondik ketin ser çavên hinek ji me. Ev şano ji bo me pencereyek bû di bin zilm û zora desthilatiyê de. Ew jî ji bo me bû ronîkirinek.

Beşdarên vê şanoyê ev bûn: Mihemed Îftixarî, 'Elî Mehmûdî, 'Elî Azer Guşesp, Rehman Azer Guşesp, Selam

Mecîdpûr, Suleyman Ferşî, Suleyman Feramerzî,
Xullamreza Muqedem(Xellkê bakurê Îran), Selah Rostemî,
Nadir Kerêze, Reza Şemamî.
Hevkarên wê: Simayil Feramerzî, Mucteba Azarşî”
Dûrî Xerîb; Dûrî Xerîb lêqewmînek a gundekî Kirmaşanê
dihundirîne. Ev şano xwe berdide nav kûrahiya çand û êş
û elemên herêmên Kurdistanê. Zaravayê şanoyê farsiya
Kirmanşahî bû û bandoreke mezin li ser gel kir.

Festîvala Şanoyên Bajaran

Beşdarbûna endamên koma şano ya lawan li festîvalên
şonayên bajaran; li Tehranê derfetekî derdixwe ku em bi
gelek komên şano yên din re hevnas bibin. Her çiqas izna
koma şano ya lawan nehatibe dayîn wek kom beşdar bibe
û şanoyê pêşkêş bike lê tevî komên Kirmaşan û Mehabad
û Êrmiyê bi serpereştiya Nusret Seyafî Ataş Teqî Pûr û
Xulamreza ‘ezîzî (ku ew jî Kirmaşanî bû lê berpirsê
şanoya çand û huner a Êrmiyê bû) beşdar bû. Vê têkiliyê
Bokan xist rêza wan bajarên ku şano hê baştir lê dihatin
kirin. Her weha di wê salê de komên din yên bajarên Îranê
ji bo pêşkêşkirina şanoyan hatin Bokanê. Em pêngav bû
sedema têkiliyên hê zêdetir di navbera Bokanê û bajarên
din ên Îranê de.

Dewreyek Nû:

Di bihara ١٣٥٥(١٩٧٦)an de gelek ji endamên komê ji
wergirtina dîplomayê, ji kar mayîn û yan jî ji ber çûna
leşkeriyê dev ji karê şanoyê berdane. Nivîskarê van
dewran jixwe di dibistana amadehî de dixwendin,
damezrandina karê şanoyê bi berdewamî maye! Ji vê salê
ve ne tenê karê şanoyê, dest bi berhevkirina kelepûra

kurdî jî kirin. Kesin ji endamên koma şanoyê hewl dan ku beyt û heyran û folklorê kurdî berhev bikin û li ser çand û zimanê kurdî nîqaş-vekolîn- kirin!

Se(Kûçikek)yek Li Ser Bênderê

Şanonameya, Se(Kûçikek)yek Li Ser Bênderê, ya nivîskarê navûdengê Îranî, kurdê Kirmaşanê Nusret Ewla Newîdî ji bo pêşkêşkirinê hat hilbijartin. Çîroka vê şanoyê; qewmîna li gundekî ye ku mal û dahatên wan ji aliyê Hacî Selem Xor, şêx û mela, parsek, derwêş û dewletê ve tê talankirin.

Di demê benderan de ew hemû berê xwe didin benderan, jina cotyar jî wek seyekî tê nîşandan ku nahêle danê zivistanê yê zarokên wê bê revandin! Şayeste Me'rûfî li ser şanoyê karekî bêemsal nîşan dide ku bala gelê bajêr bikişîne. Sureya Behnam û Hesên Qudretî wek du zarokan; Mensur Merzengî wek mêrê jinikê, Ebûbeker 'ebdula pûr wek (Murşid-Hosta), Haşim Resûlzade wek (mela), Suleyman Ferşî wek (dikandarê bajêr), Mihemed Mî'marzade wek(Hacî Selem Xor), Humayûn Mensûrî wek (memûrê dewletê) rol luyistin. Derhêner Birayim Ferşî bû.

Apê Zincîrrêş

Piştî du mehan şanoya Apê Zincîrrêş hat pêşkêşkirin!. Di sala ١٩٧٧an de, ku piştî sala ٧٠an du şanoyên wek “balte” û “kurê axê” hatin pêşkêşkirin. Ev duyemîn car bû ku di salekî de du şano werin pêşkêşkirin. Apê Zincîrrêş; çîroka civakekeke teji şet û dîn e. Dînxane ji bijîjk, endazyar, nivîskar û mirovên pêzan tije ye.

Ev kes beşdar bûne: Qadr Fethî (Rûxoş), Birayim Ferşî(Nûser), Mihemed Faruqî (Kaşif), 'Usman Qadriyan(Bê Xeber), Humayun Menisurpûr ('Aşiq),Haşim Resûlzade(Profesor),Simayil Yosifî(Sergerdan), Mihemed Mi'marzade(Zencîrî), 'Ebidula Pûr(Dexell), Mensur Merzengî (çîrokbêj). Derhêner Birayim: Ferşî.

Ev şano berhema dawî yê koma şano ya lawan bû ku bi zimanê farsî hatiye pêşkêşkirin.

Di sala ٥٥(١٩٧٦)an de pêşandanên netewî û welatî-parêzî êdî bi diwaî hatin. Koma Şano ya Azad jî heman di vê salê de hilweşiya. Piştî wê salê û bişûnde, herkesê ku karê şanoyê kiribe endamê Koma Şano ya Lawan bû. Şanoya Apê Zincîrrê jî berhema dawî ya Koma Şano ya Lawan bû di serdema rejîma Şahensahî de!

Jiyana Nû:

Jiyana nû ya Koma Şanoyê di havîna ٥٧(١٩٧٨)an de dest pê kir. Di wê salê de keftûleftên gelê Îranê dijî rejîma Pehlewî pêş dikeve. Di polên Koma Şano ya Lawan de nîqaş li ser mijarên çandî, civakî, hunerî û felesefî dihatin kirin. Her endamekî nû ji bilî lêhûrbûna li ser hunerê diviyabû ku rê û rêbazên şanoyê fêr bibe. Di van polan de, dersên cur bi cur yê şanoyê, teorî û pratîka wê dihat dayîn; deng, nefes, mîmîk, karê laş, ezmûnên bicihanîna rol û gelek tiştên din. Her şanogerek di beşdarbûna van polan de, di rastiyê de rolek ê şanoyê didît!

Şanoya Lawan Di Nav Gel De

Evarekî dereng, dema ku em ji yek van polan, di destpêka havîna ١٣٥٧(١٩٧٩)an de derketin, dengê hat guhê me. Em li fêrgeha Lîseyê ya li ser kolana Perwerdehî û Hînbûnê bûn. Em ber bi deng û galegala ku ji aliyê şaredariyê ve dihat birê ketin. Li ber deriyê şaredariyê nêzî ٤٠٠٠ kes kom bibûn û dazwaza av û birqê dikirin ku diviyabû bi şaredariyê re biaxivin. Lê di wê êvarê de kesek li şaredariyê tunebû. Ji şaredariyê ku li pêşberî şaredar bû, gotin ku hemû berpîrsên bajêr li mala endamê parlentoyê Mihemed Nûrî ne. Bîst kes ji komê li wir hebûn, em bi gel re meşîyan, mala birêz nûner li ber roniya çirayê wek rojê dixwiya. Polîs li dora mala wî bûn. Gel daxwaziyên xwe derbirî. Lê ne birêz şaredar ne jî nûner(endamê Parlementoyê) nehatin derve. Ji ber ku mirovên nûner û polîsan pêşiya gel girtin, deng û xirecîrê hê zêdetir gel li wir de kom kirin. Cendirmeyan jî nû xwe gihandibûn wir ku hewl didan girseyê berbelav bikin. Lê gel daxwaziya bersivê dîkir. Di dawiyê de bi fermana reîsê cendermeyan teqe(gulereşandin) kirin. Heta derengiya şevê teqeyên polîs û cendermeyan domand. Roja piştî wê bi bihaneya ku “endamên şanoyê gel tehrîk kirine” gazî bavê endamên şanogeran kirin bo şaredariyê. Ew agahdar kirin ku pêşî li zarokên xwe bigrin da ku li pey fitneyên biyaniyan nekevin.

Çend roj piştî wê şevê bi sedemeke din xwepêşandanek mezin li bajêr hat lidarxistin.

Encûmena Zanistî û Wêjeyî

Payîza ٥٧(١٩٧٨)an Koma Şano ya Lawan bi mamoste û xwendevanan re Encûmena Zanistî û Wêjeyî hat

damezrandin. Roja pêncşeman bi taybetî xwendekar, roja îniyê jî herkes beşdar dibû. Bi piranî mijarên ku pêşkêş dikirin; helbest, çîrok, nivîsar, şano, stran û mijarên din ên siyasî û civakî yên ku dijî rejîma Pehlewû bûn. Vê encûmenê heta hilweşandina rejîma Şah domand. Piştî ji ber hev belav bû.

Şanonymeşa Bêdeng

Di reşemeha(berfanbar) sala ٥٧(١٧٩٨)an de Şanoya Lawan, şanomeyek a bêdengî ji nivîsa û derhêna Ebdula Emînî pêşkêş kir. Di vê şanoyê de fikr û ramanê xwe yê siyasî dida xwiyandin: “Apê Sam li jorê ye, dewleta bazirgan li jêrê ye, siha Xomeynî li pişt Apê Sam e”. Bi vî awayî xetekî siyasî ya beloq dikeve nav komê. Encam; kom li ser karê xwe berdewam dike, di nav komê de rengên cuda jî hebûn!

Mangirtin(Rojiya Birçîbûnê): *Yekemîn şanoya bi zimanê kurdî.*

Sala ٥٨(١٩٧٩)an yekemîn şanoya bi zimanê kurdî ya bi nivîsa Ebdurehman Zengene(bi gotina Kek Enwer Reşîd li Almanya, nivîskarê şanoya Mangirtin, nivîskarek Erebi e bi navê Ce’fer Elî’ye, werger jî Fazil Caf û Rehman Zengene bûn) ji bo pêşkêşkirinê hat amadekirin!. Rojiya birçîbûnê; çîroka karkerên petrolê yên li Kerkûkê vedibêje. Ev şanome di çend şevan de li Sine, Bikaner, Mehabad, Pîranşehr(Xanê) ê hat pêşkêşkirin. Pêşkêşkirina Rojiya Birçîbûnê li Bajarê Sineyê hevdem bû bi hatina artêşa Îranê di roja ٢٧/٠٥/١٣٥٨(١٩٧٩)an de. Ku ev roj jî roja

dawî ya cîhada Xomeynî ku li dijî gelê kurd ragihandibû.
Bi vî awayî pêşî li karê şanoyê hat girtin.
Derhênerê şanoyê Birayim Ferşî bû. Lîstikvan (rolgir) jî;
Mihemed Mi'marzade, Mensur Merzengî, 'Elî Mehmûdî,
Qadr Serşîn, Ce'fer Mewlûdpûr, Rehîm Behramzade,
Simayil Yosfî, Salh Salihî, Ebu 'Ebdulapûr, Es'ed Husênî,
Mihemed Farûqî, Xalîd Heyderî, Ce'fer Babamîrî,
Suleyman Ferşî û kêşine din ên ku ji bajarên din ên
kurdistanê hatîn.

Şanoya Rojiya Birçîbûnê, piştî Dayîka Niştiman a
١٣٢٣(١٩٤٤)an, di dîroka Rojhilatê Kurdistanê de duyemîn
şano bû ku bi kurdî hatî pêşkêşkirin. Her weha yekemîn
şanoyê ku bi tevîbûna gelek kesên din ên ji bajarên
kurdistanê hatîn û derketîn ser dika şanoya. Pêşwaziya ji
vê şanoyê re wêneyeke giştî yê daxwaza gel ji bo çand û
zimanê kurdî derdixist pêşberî wan.

Li bajarê Seqizê dema ku me ji bo kêş û kurtiyên şanoyê
lêborîna xwest, mirovek temendar rabû ser piya û bi
kelogirî got: “na, kurên min, nabe ku lêborînê bixwazin,
em ji dil spasiya we dikin, we hestên xwe di dilê me de
zindî kirin ku bi salane hatiye li paşxistin, ez ji sîsalî
zêdetire mamostayê fêrgehan im, ji xwe şerm dikim ku
nikarim bi kurdî binivîsim û bixwînim! Ev hest li hemû
bajaran dihat dîtin. Di wan bajaran de deh hezar zêdetir
temaşevanên xwe hebûn.

Xweserî Ango Çi? Berhema dawîn:

Berhema dawî ya Şanoya Lawan şanonameyek bi navê
“Xweserî Ango Çi?” bû. Nivîskar û Derhêner Birayim Ferşî
bû. Di zivistana ١٩٨٠an de li bajarê Sine, Seqz, Bokan,

Mehabad û Pîranşarê hat pêşkêşkirin. “Xweserî Ango Çi?” li ser rê û rêbazên beytê kurdî hatibû nivîsandin. Form û dariştin, şêwaza axaftin û pêşkêşkirinê li gor taybetmendiyên beytê hatibû amadekirin. Nêçîrvan bi temaşevanan re dikeve nav gotûbêjan. Ev şanone; kurdek nîşan dide ku ew xweseriya rengorengo ya hemû grûpên siyasî sergêjiyê çê dike! Ev şano bi germî ji gel hatiye wergirtin û dike “Xweserî anga çî?” Wek yekemîn deqa şanoya kurdî li rojhilatê Kurdistanê bi şêwaza nû û li ser bingeha dramaya kurd a qedîm lê bê nihêrîn. Hemû beşên şanoyê yê wek mûsîqe û cilûberg bi kurdî bûn. Şêwaza lîstin û keftûlefa şanogera jî li gorî li ber çav girtina taybetmendiyên jiyanê kurdewarî bû. “Xweserî anga çî?” destpêka ezmûnkirina nû ya şanoya kurdî bû di rojhilatê welêt de hatiye gur kirin.

Şer û Şano

Li pey hev pêşkêşkirina vê şanoyê li Kurdistanê, hêzên komara îslamî yê şer, ji bo pêkanîna fermana cîhada Xomeynî berê xwe dane Kurdistanê, ji bilî wêrankirina welêt, çand, huner û pênaseyên kurdan di bin navê XWedê û Îslamê de bin pê kirin. Du alî û çend alî ve kete nav hêzên kurd û Îranîyên serhildêr! Cudahiya siyasî, îdeolojî û rêxistinî zêdetir keysê rejîmê xweş dikir. Bi vî alî û bi wî alî kete nav hêzên pêşmerge. Hêzên rejîmê cihê lingê xwe li Kurdistanê çê kirin û gund û bajar ketin bin simê wan. Hêzên serhildêr jî ketin nav paşvekişînê û heta wî aliyê sinoran çûn. Şanoya Lawan ji ber destêwerdana hizban, bi taybet destêwerdana berpirsiyariya baskê wê yê

Kurdistanî-rêxistina gêrîlayê Fidayî(Ekseriyet) li pey hev hilweşiya.

Gotinek Ji Bo Dîrokê

Şanoya Lawan bê guman yek ji paqijtirîn pêngavên karê şano, çand û rewşenbîriyê ye ku di navbera salên ١٩٧٣ û heta ١٩٨٠-an de di rojhilatê welêt de pêk hatî. Pêngaveke ku di nav rejîmekî reş de serî hildaye û di nav rejîmekî hê reştir de serî jî netewandiye. Her çiqas temenê Şanoya Lawan tenê heft sal be jî, lê kar û çalakî û hunerî û têkariyên wan ٥٥ kesa di karê şano, çand, siyasî û civakî de ji bejna wan bilidtir bû. Di dema ku hemû taybetmendiyên kurdî qedexe bû de Şanoya Lawan digel karê şanoyê, karakterê kurd û zimanê kurdî li ber çav digirt û wisa berhemên şanoyê pêşkêş dikir. Di dema ku çanda kurdî ji aliyê rewşenbîrên kurd bi xwe ve bi çaveke nizim lê dihat nêrîn de dest bi berhevkirina beyt û bêjên folklor û pêşandanên kurdî kirin. Endamên Şanoya Lawan ji salên ١٩٧٣-an û virve rabûn û rûniştinên wan bi kesên wek Qale Merre û Hemecan û 'Elî Kerdar û dehan kesên din ên wek wan bûn. Dema ku keft û leftên siyasî germ bûn, endamên komê, hevalên herî nêzîk ên bizavên kurdî bûn. Yekemîn lawê Bokanî yê ku guleyên rejîma şah li sînga wî ketî endamê şanoya Lawan Kemal Hemîdî bû. Her weha endamên Koma Şanoya Lawan tama zindanên Şah jî hilimijandin. Yekemîn guleyên rejîma komara îslamî ku sînga wan dirandîn jî çendîn endamên komê yên wek Mutelîb Çabûk û Es'ed Husênî bûn! Dema ku guriya çand û zimanê kurdî bilind bû jî, endamên Şanoya Lawan di “encûmena îlmî û edebî” û komeleyên xwendevan û

mamosteyan de dengê wan bilidtir bû. Piştî dîsa wan dengê şanoyê bi zimanê kurdî li rojhilatê Kurdistanê berz kirin. Ew jî di demek wisa de bû ku endamên Koma Şanoya Lawan her yek alîgirê aliyekî siyasî bû. Lê karê şanoyê, karê çandê ji bo hemûyan karê hevbeş bû. Bêguman divê hemû beşên jiyana şanoyê werin vekolîn lê ev mijareke din e.

Hizb û Şano

Piştî hilweşandina koma Şanoya Lawan, hêzên siyasî komên xwe yên şanoyê damezrandin. Ev kar bi pirranî di navbra salên ١٣٥٣(١٩٨٠) û ١٣٦١(١٩٨٢)an de li Bokanê hatin pêşkêşkirin. Têkiliya van karan bi rewşa siyasî ya demê û helwestên hêzên siyasî yên li nav bajêr û herêmê ve hebû. Naverok û formên pêşandanan û rolgirên şanoyê û derhêneran û hemû aliyên teknîkî yên van karan bi giştî girêdayî hest û bîr û zanista hunerî ya koman û keftûlefa wan bûye! Bi hebûna belgenamê û nivîsê karên wan salan, mirov dikare agahiyên zêdetir jî vebêje!

Şano Di Bin Desthilatiya Çek û Dîn De.

Piştî desthilatiya hêzên leşkerî ya Îranê di sala ١٣٦١(١٩٨٢)an li bajêr de, dika şano û pêşandanê jî vala dimîne! Piştî wê jî desthilatiya navendî bi rêyên cûr bi cûr zordarîya desthilatiya xwe qayîmtir dike. Dayîreyên xwe yên korecivakî li ser kurdan, di bin serpereştî û çavdêrî û kontrolîkirina xwe de dadimezrînin. Yek ji wan saziyan jî, “saziya danezana îslamî” bû. Bi vê jî salrojên xwe wek;

dehê fecir, şerê Îran û Êraq, cejnên din yê desthilaya xwe û bernameyên wisa pêşpêşkirine. Ku bingeha van hemû tiştan propagandeya desthilatdaran, reşkirin û dijayetiyatîkirina her tiştên ku derveyî ol-mezheba şîa û desthilatiya rûhanî bû ku bi vê jî çanda serdest di ser Îranê de qayîm bikin. Bi gotineke din; vê carê jî ji derveyî çanda netewî û welatî di çarçoveya desthilatdariya olî de hewl dida û şano û çand paşde xistin. Bi vê riyê gel û civak jî paş xistin û ev siyaseta jî bi hêz û karîna kurdan birêve dibirin. Beşek ji van bernameyan bi destê wan kesên ku demekê rêveberên bernameyên pêşandanên şahenşahî dikirin birêve diçû. Ev jî çiqas dûr an nêzîkî hunera şanoyê û karê çand û hunera neteweyî ya kurd e ji belgenameyan tê famkirin. Di vê heyamê de wan kesan xewna şanoyê dibirin ser mase û kesên din jî bi xewnên nû dên meydana şanoyê. Ew xewnên ku dane pêş çiqasî rasteqînî anîne pêşber ji aliyê xwedyên xewnan ve dikare bê dîtin. Ev jî, kengê xwedyê xewnan dê li deriyê rastiye bidin ew dizanin.

Kele Spî

Di zivistana ١٣٦٧(١٩٨٨)an de şanonameya Kele Spî ya nivîsa Îbrahîm Mekî û derhênanê Xalid Heyderî di bin navê “Koma Şano ya danezana Îslamî” ji aliyê “Beşa Lawan A Navenda Çanda û Huner A Bajarê Bokanê” vê di salona Sînemaya Wehdet de hatiye pêşkêşkirin. Di nivîsarekî de spasî ji bo “Şiketa Kooperatîfa Gundewar ê Bokanê”, Yekeya Besîcê ya Bokanê(hêza paramîlîter a Îranê) û Perwerdehiya Hêzên Ewlekarî û Rêveberî û Xebatkarên Sînemaya Wehdet Bokanê re û kesên alîkarî

daye wan re tê kirin! Li gor gotina Xalid Heyderî ew şanoya yekemîn e ku piştî şoreşê hatiye nîşandan! Rolgirên vê şanoyê ji Kuruş Şemamî, Luqman Sultanî, Es'ed Asyaban, Mezher Esrarî pêk hatiye! Çîroka vê şanoyê li ser “di şer û îmana şerkerên ku nakevin de” ye! Di wê namilkeyê de; qala; di şerê Îran û Êraq û Amerîka û şeytanê mezin de rizgariya gelan hatiye kirin! Di heman namilkê de navê şanonameyek din derbaz dibe bi navê “bêje li kû ye”. Di nivîsa Mihemed Reza Cibaran de tu agahî li ser vê şanoyê nehatine dayîn. Ne diyare ku gelo ev herdu şano heman şano ye yan du ne? Cara duyemîn ev şanone di Sêyemîn Festîvala Azerbaycana Rojava ya sala ١٣٧١(١٩٩٢)an de hatiye pêşkêşkirin. Vê carê jî derhêner Mezher Esrarî ye, Suleyman 'ebdulrehîm jî alîkar e. Rolgir jî: Mezher Esrarî, Es'ed Asiyaban e.

Komediya Şahensahî Bi Şêwaza Îslamî

-Çayxaneyê Azadî ya Mam Qenber! Nivîskar...?

Derhêner...? Bi minasebata ١٠ê Fecr* bernameyek ji aliyê “Navenda Tendurîstî û Derman a Bokanê” ve di salona Sînemaya Wehdet de saet ٦ê piştî nîvro ya sala ١٥/١١/١٣٦٨(١٩٨٩)an de hatiye pêşkêşkirin. Di nivîsarekî de karîkatorê M-Qureyşî yê ku razaye û wêneyê Mihemed Kerîmî û kesên din tê de hatiye nîşandan; “ Bi beşdarbûna hunermendên payebilind ê sirûda îslamî(Ehmedî Îslamî, Mihemed Daniş) Şanoya Komedi û rexnegirane bi beşdariya hunermendên Mehabad û Bokan”!

-Pêşandana “ Nivîsa Se’îd Şapurî, Derhêner Xalid

Heyderî. Rolgir: Mezher Esrarî, Reza Şemamî, Muhsîn Şuca’î! Dem: 9/7/1379(1990) sa’et 12ê piştî nîvro. Cih: Salona Heyva Sor a Bajarê Êrmiyê. Ev şanoname di Festîvala Yekemîn a Azerbaycana Rojava de li Êrmiyê tê pêşkêşkirin.

- Resm Ber îf Est(kevneşop wisa ye): Nivîskar: Seyid Mehdî Şuca’î, Derhêner: Muhsîn Şuca’î. Rolgir: Muhsîn Şuca’î, Mensûr Qadîrzade, Sima’îl Ehmedyan, Qerenî Qaremanî, Mezher Esrarî, Nadîr Qaremanî, Se’îd Qaremanî, Suleyman 'ebdulrehîm Zade. Dem û Roj û cih: 30/5- 8/7/1370(1991)an Salona Heyva Sor a Bajarê Êrmiyê. Ev şanoname di Duyemîn Festîvala Şano ya Azarbaycana Rojava de ji aliyê Saziya Danezana Îslamî ya Bokaî ve hatiyê pêşkêşkirin.

-Gum(Wenda): Nivîskar: Îbrahîm Mekî. Derhêner: Xalid Heyderî. Rolgir: Mezher Esrarî, Bextiyar Şemamî. Dem û Cih Roj: 30/5- 11/7/1370(1991) li Mala Çandê ya Êrmiyê. Ev şanoname di Duyemîn Festîvala Şano ya Azarbaycana Rojava de ji aliyê Saziya Danezana Îslamî ya Bokaî ve hatiyê pêşkêşkirin.

-Behar Der Beharan(Bihar Li Biharan: Pêşandan, sirûd û mûsîqe di perdeyên komediyê de! Ev bernameyek bû ji aliyê Saziya Danezana Îslamî ya Bokaî ve di meha Axlêve(Adar)ya sala 1371(1992)an de li Salona Şehîdan hatiye pêşkêşkirin. Pêkhênerê bernameyê Xalid Heyderî ye. Di vê bernameya hemerengî de şanonameyên “Pîknîk di meydana şer de” ya Firnando Arabal, bi derhênana

Xalid Heyderî şanoyek din a bi navê “demeteqey xawen mall û kirêgrte” û “ Derhênerê ji Ferengê Hatî” li bajarê Miyanduwê, û “wîdeyo û pêwendî” û “Bungay Mu’amilatî” û “Fete û ‘eze” li bajarê Bokanê hat pêşkêşkirin. Navê rolgiran bi hev re hatiye dayîn ku ew jî ev in: Mezher Esrarî, Smayil Ehmediyan, Es'ed Asiyaban, Mihemed Salih Bikrek, Birayim Fetahyan, Cemall Fithî, Ce'fer Qadirî, Suhrab Qaremanî, Mecîd Palewanyan, Tuba 'ebdî, Es'ed Qaremanî, Hesên 'Elîzade, Mewlud Mecîdî, Efşîn Nasirî, Areş Nasirî, Luqman Nencarî, Reza Palewanyan, Îrec, Reza 'Ebidulrehîm Zade. Derhêner: Xalid Heyderî û Alîkar Mezher Esrarî. Stranbêj Kemal Mihemedî! Di namilkeya vê bernameyê de nivîsek li ser komediyê heye. ‘ezîz Merdanbegî bername pêşkêş kiriye. ‘Ezîz Merdanbegî wek dengxweş û şanoger bi salan li ser dika şanoya Bokanê bû. Ji ber qeyrana dil jiyana xwe jidest da.

-Baz Baran(Dîsa Baran). Nivîs: Mihemed Çirmşîr, derhêner: Xalid Heyderî. Rolgir: Mezher Esrarî û Reza Şemamî bûn. Ev şanosome di festîvala sala ١٣٧٢(١٩٩٣)an ya Êrmiyê hatiye pêşkêşkirin. Derhênerê şanoyê di namilkeya şanosomeyê de dibêje: “ Em li vir kom bûne daku festîvala şanoyê birêve bibin. Ku hevdeng e bi cejnên şoreşê re, şoreşa ku kariye bibe sedema pêşandana wê çand û kelepura ku wînda bibûn. Di vî welatê berfireh de gelek gotinên ku nehatine gotin hene ku di fikr û sîngan de mane. Bi şanazî em dikarin bêjin heke wek şano werin amade kirin, em dikarin deynin pêşberî şanosomeyên cîhanê”

Li ser pêşkêşkirina vê şanonameyê di rexnegirtinê de wisa hatiye nivîsandin: “Dekor di cihê xwe de bû, ronahî baş bû, efekt di cihe xwe de bû, ji aliyê derhênanê ve dibe ku di salên dahatû de em karê baştir ji vê komê bibînin.” Bîr û nêrînên temaşevanan di vê nivîsînê de wisa danîne: “tekst(şanoname) û pêşkêşkirin hev nagrin. Karmendê yekemîn ji aliyê hestan ve lawaz bû. Tekst û liv û mîzansan gelek bezîn tê de hebûn. Serê min gêj bû ji şêwaza vê ronahiyê, ewqas vemirandin û vexistin ji bo çi bû??

Ev kom bi ser Çand û Irşada Îslamî û Pirtûkxaneyê Selahedînê Eyûbî ya Bokanê bû. Spasiya van aliyên li jêrê kiriye: Îrşada Îslamî Ya Azerbaycana Rojava, Femandariya Bokan, Zanistgeha Peyam Nur a Bokanê, Encumena Pêşandanê ya Bajarê Miyanduaw.

-Pencerêhayê Ber Badha(Pencereyên Li Ber Bayê): Nivîs: Doktor Ferhad Zadekirmânî, Derhênan: Es’ed Asyabyan. Rolgir: Es’ed Asyabyan, Mîna Feyzî. Ev şanoname ji aliyê koma encûmenên pêşandanê ve, bi alîkariya “Komeleya Çand û Henerê” di yekemîn festîvala şano ya Bokanê de, di roja 3/11/1373(1994)an de hetiyê pêşkêşkirin.

Dam(Xefk): Nivîskar: Alfred Ferec, Derhêner: Suhrab Qaremanî, Alîkar: Reza Ebdulrehîm Zade. Rolgir: Suhrab Qaremanî, Qurban Exewan, Xusrew Qan’î, Mihemed Rehîmî, 'Ebdulrehman Çawşînî, Kamran Qelekuhî. Ev şanoname ji aliyê koma Şano ya Azad ve bi alîkariya “komeleya Çand û Hunerê” di yekemîn festîvala Şano ya bajarê Bokanê, roja 4/11/1373(1994)an de hatiye pêşkêşkirin.

-Mesîh Herqêz Nexahed Mord(Mesîh Qet Dê Nemire)”:

Nivîskar: Mihemed Çirmşîr. Derhêner: Reza Şemamî.
Rolgir: Reza Şemamî û Kuruş Şemamî. Di yekemîn
festîvala Şano ya bajarê Bokanê, roja ٤/١١/١٣٧٣(١٩٩٤)an
de hatiye pêşkêşkirin.

Der Hizûrê Bad(Li Cem Bayê): Nivîs: Behram Beyzayî,
Derhêner: Ebdulrehman ‘Ezîzî, Rolgir: Ebdulrehman Ezîzî,
Simayil Ehmedyan, Simayil Behramî. Şanoname karê
Encûmena Pêşandanê bû, bi hevkarîya “Komeleya Çand û
Hunerê” Di yekemîn festîvala Şano ya bajarê Bokanê, roja
٥/١١/١٣٧٣(١٩٩٤)an de hatiye pêşkêşkirin

-Mehremane(Veşarî): Nivîs: Nesrila Qadirî. Derhêner
Simayil Ehmedyan. Rolgir: Mezher Esrarî, Nadir
Qaremanî. Ev şano ji aliyê koma “Sûsa” bi hevkarîya
Encûmena Pêşandanê û Komeleya Çand û Hunerê ve di
yekemîn festîvala Şano ya bajarê Bokanê de, di roja
٥/١١/١٣٧٣(١٩٩٤)an de hatiye pêşkêşkirin. Ji bo festîvalê
spasî ji Rêveberiya Giştî Ya Çand û Îrşada Îslamî,
Femandariya Bokan, Saziya Danezana Îslamî Ya Bokanê
re hatiye kirin. Bernameya vê fastîvalê bi “axaftin”,
pêşkêşkirina mûsîqe, beyannameya
hakeman(ferwerdeyan), dayîna xelatan û mêhvandariyê
qediyaye. Roja ٣yê rêbendanê dest pê bûye û ٦ê
rêbendanê qediyaye. Di çarçoveya festîvalê de sê
namilkeyên bi navê “weşanên taybet ê festîvalê”
derketin. Kesên berspirsiyar ev bûn: Gerînendeyê
karûbarê Turec(...)Se’îdî Keya, Edîtor: Xalid Heyderî,
Edîtorê nivîsê: Reza Şemamî, rûpelsaz: Simayil

Ehmedyan, çap û belavkirin: Ewla Çûpanî, wênegir û repartûar: Mezher Esrarî. Spasiya Nasirî û Qasim Mehdî Zade hatiye kirin. Ev namilke bi berg ve ١٢ rûpel bûye û hatiye kopyakirin. Gotûbêj û mijara huner û şano û qewmînên li ser festîvalê dihundirand. Zimanê namilkê wek zimanê hemû Şanoyan bi farsî bû.

-Şeb Ve Gorbêyê zîrê taqî(Şev û Pisîka Li Bin Taqê): Nivîs: Mihemed Çirmşîr, Derhêner: Xalid Heyderî. Rolgir: Hadî Se'dî û Simayil Ehmedyan. Ev şanoname beşdarî Heftemîn Festîvala Azarbaycana Rojava bûye. Di ٢/٨/١٣٧٤(١٩٩٥)an de li Mala Çandê hatiye pêşkêşkirin. Broşûra şanonameyê karê Mihemed Rostemzade ye, wêneyê darekî bi tenê li ser e û du pel jê weşiyane ser erdê, di palê de ev risteya Se'dî dixwiye:
"benî adem e'zayê yekdîgerend ke der aferîneş zi yek guherend"* (Ademîzade endamên hev in ku di afirandinê de ji yek cewher in): Xalid Heyderî di çarçoveya vê festîvalê vedibêje: "Di sala ١٣٥٤(١٦٧٥)an de, di şanonameya " "Bam ve zîrê bamha-ban û binê banan" de doktor Sa'dî rol girtiye û bi wê şêwazê ketiye nav cîhana şanoyê. Wek şanoger û derhêner di şano û televîzyonan de kar kiriye"! Di derbarê pirsgrêk û astengiyên şanoyê li Bokanê de, dibêje: "dibe ku pirsgrêk û astengiyên sereke ji aliyê gel ve nebûna zanyariyên hunerê" bê. Ew gazindê xwe ji bîr û fikrên gelk dike ku dixwaza karênn pêş çav weke pêşandinê komêdîyê ne û ev jî wê derfetê nade pêdiviyên kevneşopî ji aliyên gelve werin girtin". Dîsan dibêje: di dereceya yekemîn divê em bîr li fikra civakê bin. Nîşandana pêşasndanên kevneşopî

û folklorî ku pêdiviya gel pê heye, dikare roleke baş
bileyze. Piştî jî hînkirin û lêanîna li ser dike....”

Erşîva Şîroveyan

-Çîroka Bodroma Bereskû; nivîs: Reza Şemamî, Derhêner:
Xalid Heyderî. Rolgir: Mihemed 'elî 'Ebdulapûr, Reza
Şemamî, Siruh Şêxî, Hadî Es'edî, 'Elî Rezayî, Meryem
'ebdulrehîmzade, Kuroş Şemamî, Nazdar Me'rûfî, Mes'ud
Sena'etî, Cemşîd Qelekuhî, Emîr Muqtedirî, Cemal
Xodakerîmî, Simayil Nûmuselman, Kawe Mihemedzade,
Siyawîş Exewan. Ev şanosome di meha
gelarêzan(Cotmeh)a ١٣٧٦(١٩٩٧)an di Nehemîn Festîvala
Şanoyê de li Êrmiyê hatiye pêşkêşkirin. Li ser berga
birûşûra wê wêneyê kareseta Helebceyê berbiçave. Dibe
ku peywendiya şanosomeyê bi vê qewmînê re hebe.

-Qesrî Xorşîd(Qesra Rojê; Nivîs: Reza Şemamî. Derhêner:
Xalid Heyderî. Rolgir: Îran Ehmed Pûr, Es'ed Asyaban,
Zêneb Sadiqyan, Reza Şemamî, Kuroş Şemamî, Husên
Sadiqyan, Mensur Husên Zade, Suhrab Qaremanî,
Muhsîn Şerefî, Hesên Salihî, Qurban Exewan, Yosif
Heyderî, Mes'ûd Sena'etî, Helale Rehmanî, Şilêr Esma'îlî,
Mihemed 'ebdulapûr, Fereydun Ferehnak, Husên Xizirî,
Susên Şerefî. Ev şanosome di rêbendana ١٣٧٥(١٩٦٦)an
de hatiye pêşkêşkirin. Di dawiyê de, spasî Ji Navenda
Hunerên Pêşandanîyê Ya Îranê, Rêveberiya Giştî Ya
Huner û Îrşada Îslamî, Saziya Danezana Îslamî, şaredarî,
perwerdehî û fêrgehî, tendurustî, Zanîngeha Peyamnûr,

bûroya nûnertiya parlamentoyê, nûçegihanên rojnameya
îran, radyo û tv yê
Ûrmîyê û Mehabadê, kiriye.

Tabloyel Li ser Berhemên hatîn pêşandan

Berhemên Şanoyê yê ku hatîn Lîstin					
Şanone	Nivîskar	Derhêner	Sal	Cih	Ziman
Kune Şkeft	Nasir Îranî	Mihemed Riza Eqzel	١٩٧٤	Bokan	Farsî
Balte(bivir)	Nîkolay Gogol	Umer Hemîdî	١٩٧٥	Bokan	Farsî
Kurê Axê	'E. Hemîdî	'E. Hemîdî	١٩٧٥	Bokan	Farsî
Dûriya Biyani	Nusret Seyafî	Emînî?	١٩٧٦	Bokan	Farsî
Seyê Li Ber Bêderê	Nusret Newîdî	Ferşî	١٩٧٧	Bokan	Farsî
Apê Zincîrrê	Beşer Dost	Ferşî	١٩٧٧	Bokan	Farsî
Rojîya Birçîbûnê	'E. Zengene	Ferşî	١٩٧٩	Bokan, Mehabad, Pîranşehr, Seqiz, Sine	Kurdî
Xweserî Ango Çi	Ferşî	Ferşî	١٩٨٠	Bokan, Mehabad, Pîranşehr, Seqiz, Sine	Kurdî
oktober	Soltanî/Ferşî	Ferşî	١٩٨٢	Çiya	Kurdî
Koşka Miradan	Ferşî/Hêmin	Ferşî	١٩٨٣	Çiya	Kurdî
Çend	Ferşî	Ferşî	١٩٨٤	Çiya	Kurdî

Şanoyên Wêneyî					
Zindan	Manî	Ferşî	١٩٨٦	Frankfurt	Farsî
	Nasir	Nasir	١٩٨٧	Axin	Farsî
Fanteziya Zarokan	Ferşî	Ferşî	١٩٨٨	Koln	Almanî
Sinor	Gizîla Marks	Gizîla Marks	١٩٨٨	Koln	Almanî
Nanê Jehrkirî	Wasîlî Xançîf	Ferşî	١٩٩٠	Koln	Kurdî
Gula xwînavî	Ferşî	Ferşî	٩١-٩٤	Koln	Kurdî
Rev	Ferşî	Ferşî	٩١-٩٤	Koln	Kurdî
Şanoya Ser Kolanê	Cêsîka û Martîn	Ferşî	٩٢-٩٢	Koln	Almanî
Î win(...)	Mirzok	----	١٩٩١	Koln	Almanî
Bi tenê û her cûre bi hevre	Ferşî	Ferşî	١٩٩٢	Koln/Kasl	Almanî
Şer Di Mala Hejar de	Ferşî	Ferşî/Marîn	١٩٩٢	Koln	Almanî
Zindanî	Ferşî	Suleyman Ferşî	١٩٩٤	Koln	Pantom îm
Senfoniya Helebceyê	Refiq Sabiir	B./Gewhr Ferşî	١٩٩٤	Koln	Kurdî
Erd	Ferşî	Ferşî	١٩٩٦	Koln	Kurdî
Mandana	Ferşî	Ferşî	١٩٩٧	Koln	Kurdî
Zindan	Du Zindanî	B./Gewhr Ferşî	١٩٨٨	Koln	Almanî

Kurteyek li ser jiyana Birayim Ferşî(Baram) û Berhemên Wî

Li bajarê Bokanê ji dayîk bûyê, şanoger û nivîskarê derbarê çandê ye û li Almanyayê dijî.

Pirtûkên wî yên çap bûyîn.

- ١-Şano ٢٠٠٢
- ٢-Nalleyek Le Hawarda ٢٠٠٢
- ٣-Mandana(Şanone ١٩٩٦)
- ٤-Zewî (Şanone ١٩٩٥)
- ٥-Zimanî Dûla ٢٠٠٢
- ٦-Musîqay Kurdî Le Nêwan Hawar û Hîwada ٢٠٠٢
- ٧- Projekanî Frekulturî Şanopêdagogî (bi zimanê Almanî ٢٠٠٢)

Pirtûkên wî yên çap nebûyîn.

- ١- Hunerî Axavtin(Le Zimanî Îlmanîyewe Bo Ser Zimanî Kurdî)
- ٢- Spielpädagogik (Dersiname Bo Mamostayi Baxçeyi Mindallan) (Bi zimanê Almanî)
- ٣-Kommunikation Training (Metodî Pêwendîyekani Nêwan Mirov- Dersinamh)(Bi zimanê Almanî)
- ٤-Dersiname Bo Progamekanî(Word, Excel, Powerpoint) û Întirînêt(Bi zimanê Almanî)

Pirtûkên wî yên dijîtal (bi rêya internetê hatîn weşandin)

- ١-Zîrek Hunermendî Neteweyekî Bin Dest(Bas û Lêkolîn)
- ٢-Eger Şano Le Kurdistan Mirdibê Çî Zînduwe?(Bas û Lêkolîn Li ser Şanoya Başurê Kurdistanê)
- ٣- Telewizyon Le Nêwan Damezrandin û Darrizandinda(Hellsengandina Televizyonên Kurdan)
- ٤-Medersey Duktur Se'dedînî Merwanî(Rêze pêşandanên Televizyonî û Şanoyî Tenz û Rexne)
- ٥-Kordistan Serzemînê Renc Ha û Tecrobe Ha(Komek Gotarên Berhev û Raveyên Siyasî- Bi Zimanê Farsî)
- ٦-Şanoyî Daykî Nîşitman û Koşkî Awat(Lêkolîn û Şanona)
- ٧-Seferêkî Xeyallî Bo Bokan(Nasandina Bokanê ji aliyê çandî û Hunerî ve di deh salên ٧ · û ٨ · Bi rêwîti geriyane- Tewrêz Sala ١٩٨٤)
- ٨-Gerran Be Şwên Ferhengî Madekanda(Lêkolîn)
- ٩-Hellebce û Kosar, Mehabad û Gullebax Le Wlatî Çnar û Hêmin(Nasandina Rewşa çand û Huner û Perwerdeya Başurê Kurdistanê Bi rêwîti geriyane – Sala ١٩٩٤)
- ١٠- Rojhellaî Kurdistan û Pirsî Siyaset(Komek Babetên Siyasî)
- ١١-Le Xuda û Pêxember û Dewllet Detirsm(Komek Babetên Taybet bi çand û Siyaset)
- ١٢-Wêney, Dengî Dill û Bêdengî Mêşk(Komek Têkst Bo Rahênana Dengê Şanogêrr bi Du Zimanê Kurdî û Almanî)
- ١٣-Kamkarekan, Xaliqî, Qeredaxî û Musîqay Kurdî(gotûbêjên Li ser Musîqaya Kurdî di navbera salên

١٩٩٣ Heta ١٩٩٨, berê bi Zimanê Almanî hatiye
belavkirin)

١٣- Hesen Zîrek Û Zimanî Dûla

**Lêkolîn û babetên şanoyî û sînemayî (Bi rêya Kovar û
rojnameyên navxweyî û derveyî welat û internêtê hatîn
belavkirin)**

١-Rîtwall Û Taziyegêrran (Lêkolîn, Babeta Semînerê di
festîvala Şanoyê ya li bajarê Hanofr- Bi Zimanê Almanî)

٢-Sîstmî Sema Û Dengî Derwêşan (Bas Û Lêkolîn Li ser
deng Bi zimanê Almanî)

٣-٥٠- Sall Nmayiş Û Şano Le Bokan(Mêjû)

٤-Bîrewerî Li ser Tîpî Şanoy Law(Grohê Tatir Cewan)Î
Bokan

٥-Dengî Şanogêrr(Teorî Û Teknîka Deng di Karê
Şanogêrrî Û Wêjerîyê de)

٦-Kurte Basêk Li ser Şanoy Kurdî Le Konewe Û Şano Le
Rojhellatî Kurdistan(BeşekeLêkolîyê Li ser Rê û rêbazên
Şanoyê di nav Kurdan de, ev destpêka kareke mezintire
ku pêwistiya bi çend pirtûkên k udi vir de jî navê wan
hatiye kirin heye.)

٧-Dirwazey Basêk Bo Şano Û Mêjûy Şanoy Kurd(Kurte
Baseke ji Bo Pênasekirina Şanoya Kurdî)

٨-Xudmuxtarî Yanî Çî? ١٩٧٩(Şanoname)

٩-Nawendekanî Şano Û Fstîwalî Şano Le
Urupa(Nasandina Nawendên Şano yê Awropa)

١٠-Rojjimêrî Fstîwalekanî Şanoy Bûkeşuşe Le Urupa(
Nasandina Festîvalên Bûkeşuşe Li Awropa)

١١-Rojî Cîhanî Şano Le Amêd(Rapurt)

١٢-Leyla Bedirxan Semakerî Kurd

١٣-Mangî Gullan, Mangî Nawendî Şanoy Koçer(Kurte
Nasandinek a Nawenda Şanoya Koçer)

- ١٤-Opray Zerdeşt Le Kontrîn Şanoy Cîhan Pêşkeş
Dekrê(Raport)
- ١٥- "Art Kollon" Benawbangtirîn Pîşangay
Urupa(Raport)
- ١٦-Fstiywallî Kurte Fîlmî Hunerî Le Allman(Nasandin Û
Raport)
- ١٧- Sînemagerî Kurd Û Rojnamekanî Allman(Basî
Sînema)
- ١٨-Zncîre Fîlmî "Cum'e" Le Terazûy Bînerêkda!? (Bas Û
Rexne)
- ١٩-Tenya Kîsellekanî Qubadî Defrîn! (Bas Û Rexne)
- ٢٠-Sînemay Qubadî Û Hiwakan
- ٢١-Selaîedîn Eyyubî Û Kîsellekan(Sînema Cîhanî û tîmî
Kurdî)